

Rojava ji nû ve şîn bike

Destekdayina şoreşa ekolojîk li Bakurê Suriyê



Komîna Enternasyonalîst a Rojava

Pêşkêşkirina kampanya bi hevkarîya saziyên fermî yên Rêveberiya

Xweser a Bakurê Suriyê



Bingeh

Ev pênc salên zêdetir ji roja 19'ê Tîrmeha 2012'an destpêka şoreşê derbasbûn. Ji dema berxwedana lêheng a Kobanê ve YPG û YPJ her ku diçe bêhtir çeteyên paşverûn yê DAÎŞ'ê tengav dikin û paş dixînin. Di heman demê de gelê Rojava bi awayekî serkeftî li dijî tevahî hewldanên hêzên hegemon ku dixwazin vê şoreşê hilweşînin yan ji rê derxînin, berxwedide bi awayekî serkeftî gelê Rojava van hewldanan vala derdixe. Di bin serkêşiya fikra Rêber APO de, bi pêşengtiya têkoşîna Tevgera Azadî û bi paradîgmaya civaka demokratîk, ekolojîk û azadiya jin re di nava kaosa Rojhilata Navîn û şerê Suriyê de tevgerê şoreşger xwe rêxistin dike da ku serdema modernîteya kapîtalîst bi dawî bike. Ruxmê destkeftiyên vê şoreşê jiyana gelê vir di bin metirsiyê de ye: Şerê DAÎŞ'ê, terorîzma dewleta Tirk û embargoya ku li ser Rojava tê meşandin li pêşiya însakirina civaka nû asteng in. Di rewşekê wisa de piştgirî li ser asta cîhanê pêwîst e.

Komîna Enternasyonalîst – Bialime, Destek Bike, Rêxistinbike

Ev çend salan em wekî Enternasyonalîstên ji çar aliyên cîhanê ve di nava saziyên cûr bi cûr li Rojava cihê xwe digirin. Bi tesîra perspektîfa şoreşger a Tevgera Azadî em li vir in da ku em fêrbibin û di heman demê de karibin destek bidin xebatên heyî heta ku wana jî pêşbixînin. Hedefa me rêxistinkirina nifşekê nû ya enternasyonalîzme li beramberî modernîteya kapîtalîst. Di vê çarçoveyê de me di sala 2017'an de bi piştgiriya Yekitiya Ciwanên Rojava û Yekitiya Jinên Ciwan (YCR/YJC) Komîna Enternasyonalîst a Rojava avakir. Heta niha me di çarçoveya perwerde, delegasyonan û dewreyên ziman de xebat meşandî her wiha akademiya yekemîn a civakî ji bo însanên enternasyonal li Rojava hatiye çêkirin.

Yek ji şaxên herî bingehîn ya şoreşê: Ekolojî

Însanê ji xwezaya xwe qutbuyî, ji cewhera xwe qutbûye, însanê ku hebûna xwe hildiweşîne – ti sîstemekî wekî sîstema kapîtalîst vêna zelal nekiriye: Xirabkirina xweza û hawîrdor û qeyranên ekolojîk bi kedxwarî, koletî û bîndestî ve girêdayî ne, ji hev nayan qutkirin. Zihniyeta ezezî ya berjewendîperest cîhana me anî ber bi kendalê ve, mirovatî ketiye nava kaosekê mezin, şer, birçîbûn û qeyranên civakî. Ji ber vê yekê çawa ku azadiya jin û civakekê demokratîk esas in, pêşxistina sîstemekê civakî ya ekolojîk jî yek ji şaxên herî bingehîn a Şoreşa Rojava. Mijar ne tenê tedbîr girtine, kêmkirina zerara ku çêbûye, yan parastina seranser a xwezayê. Mesele ji nû ve avakirina hevsengiya cewherî di navbera însan û xweza de ye, yanî bi zanabûn veqera civaka xwezahî.

Monoçandinî , kêmbûna avê û qirêjkirina hewa: Mêtîngerî li dijî însan û xweza

Encamên zihniyeta kapîtalîst û zordestiya dewletê li Rojava ber bi çav in. Rêjîma Baath ti carî jiyaneke ekolojîk nefikirî. Bi taybetî li Rojava ku di bin dagirkeriya Suriyê de bû, talankirina erd û ax, bilindbûna daneheva berhemên çandinî esas bûn. Bi awayekî sîstematîk daristanên vê herêmê hatin birîn û li şûna vê derfetên monoçandinî a genim li Cizîrê, zeytûn li Efrînê û ji herduya li Kobanê çêbûn. Bi dehan salan qedexa bû ku dar werin çandin yan bexçe werin çêkirin. Bi vê siyaseta û rê û rêbazên din ve gelê Rojava mecbur ma ku wekî karkerên erzan li bajarên mezin wekî Heleb, Reqa û Şam kar bikin. Şewazên danehevkin û şixolandina enerjî, kêmahiyên paqijî û bikaranîna madeyên kîmyawî ji bo çandinî zextekî mezin li ax, hewa û avê kirin.

Gelê Rojava tenê li hemberî van pirsgerêkan îro têkoşîn nameşîne. Dijminatîya dewleta Tirk tehdîtekê rojane ye. Ji aliyekê ve êrîşên leşkerî û embargo, ji aliyê din ve bi taybetî însakirina bendavan li Bakurê Kurdistanê û bêşnor derxistina avê ji erdê pirsgerêkên mezin ji bo çandinî û ekolojîya herêmê ne. Di encamê de her ku diçe çemên li Rojava ku ji aliyê Bakur ve tîr kêr dibin – bi zanabûn dewleta Tirk ava li Rojava qut dike.

Di navbera şer û embargo de – Xebatên Ekolojîk li Rojava

Hewldanên dewleta Tirk ku Şoreşa Rojava di nava êrîşên leşkerî, siyasî û aborî de bifetisîne, şerê li dijî DAÎŞ'ê û embargoya li ser Rojava ku ji aliye PDK li Başurê Kurdistanê ve jî tê meşandin, şert û mercên zehmet ji bo pêşxistina xebatên ekolojîk li Rojava çêdike. Ji aliyekê ve projeyên cûr bi cûr ji bo çêkirina herêmên parastina xweza, derxistina çopê û ji nûve çandina daristanan hene, lê ji aliyekê din ve gellek nakokî û mecburiyetên cûda jî hene. Piraniya proje û komîteyên heyî hîna di destpêka xebatê xwe de ne, yan ji bilî plansaziyê tiştêk nikarin bikin. Şoreşa ekolojîk hîna jî li benda pêkanîna ye. Hem asta zanabûnê jiyaneke ekolojîk çawa dikare were meşandin kêr e, hem jî pisportîya van mijaran pir kêr e. Her wiha derfetên madî û teknolojiya pêwîst nîne.

Însyatîfa me ji bo şoreşa ekolojîk: “Rojava ji nû ve şîr bike”

Em wekî Komîna Enternasyonalîst li Rojava dixwazin beşekê ji pêşxistina jiyana alternatîf a ekolojîk hilgirin ser milên xwe û ji ber vê yekê em bi hevkarîya Komîteya Parastina Xwezayê ya Kantona Cizîrê û Komîteya Ekolojîk kampanya “Rojava ji nû ve şîr bike” îlan dikin.

Ev kampanya 3 bêşê xwe hene:

1. Bi pîvanên jiyana ekolojîk însakirina akademiya enternasyonalîst, wekî projeyekî pîlot ku bibe mînak ji bo jiyaneke ekolojîk di nava civakê de. Bi vê ve girêdayî perwerde jî were rêxistin kirin.
2. Tevlîbûna projeyên ekolojîk ji bo çandina daristanan û bi taybetî çêkirina şitilgehê wekî beşekî ji akademiye.
3. Destekdayîna projeyên heyî û projeyên pêşerojê yê ekolojîk aliyê madî û zanistî.

Projeyên destpêkê yê kampanya “Rojava ji nû ve şîn bike”

- Pratîzekirina jiyaneke ekolojîk li cihê akademiya enternasyonalîst. Çêkirina şitilgehê û di buhara îsal 2018’an de çandina 2.000 daran û 50.000 şitil.
- Alîkarîdayîna pratîkî û madî ji bo Komîteya Parastina Xwezahî ya herêma Hayaka nêzikî bajarê Dêrikê. Plansazî di nava 5 salan de çandina 50.000 daran li cem avê ye.

Xebatê kolektîf û komînal di şitilgehê û Hayaka de wê bibe beşekî ji perwerdeya akademiye. Di heman demê de piştgirîkirina komîn û saziyên gel e.

“Rojava ji nû ve şîn bike” pîrekî di navbera gelan de ye

Derfetên destekdayîna Şoreşa ekolojîk wiha ne:

- Têkilîyên bi rojnamevan, siyasetmedar û kesayetên navdar çêkirin û parvekirin
- Nivîs û reportaj di derbarê kampanya de biweşînin
- Peywendî di navbera kesayet/grub/rêxistinên û Komîna Enternasyonalîst danîn

- Li Rojava xebat kirin
- Berhevkirina zanabûn di derbarê aborîya daristanan û çandiniya ekolojîk, sîstema avê, û çêkirin/qezenckirina enerjî
- Agahiyên heyî bi derdora xwe re parvekirin û nîqaşkirin
- Alîkariya madî bidin kampanya û xebatên heyî.

Têkilî:

Mail: makerojavagreenagain@riseup.net

Web: www.internationalistcommune.com

Facebook: facebook.com/CommuneInt

Twitter: twitter.com/CommuneInt

Destek:

Rote Hilfe

IBAN: CH82 0900 0000 8555 9939 2

BIC: POFICHBEXXX

Post Finance

Stichwort „Make Rojava Green Again“

